

## NEWROZ ÇÎ YE?

Ali Husein Kerim

Newroz, kevintrîn cêjna gerdûnê ye ku heya naha tê bîranîn û pîrozkirin.  
Newroz vejîna xweza û hemû aferideyên wê ne.  
Newroz, di têkoşîna navbera qencî û neqenciye de, roja serkeftina qenciye ye.

## KÊ NEWROZ AFİRANDÎ YE?

Newroz, berhema hiş û heçanên hevbeş a hemû mirovahiyê ye.  
Mirov herdem hêviya dem û rojên nû ne. Jixwe, havîrdor û civak hîkara xwe li ser hest û derûna mirovan dikin. Ev taybetiyeke hevbeş e. Roja nû ya hevbeş a herî guncav û bibandor Newroz e.

Li pêş hêzên xwezayê mirov ditirse, li ber xwe dikeve û berxwedide, hêrs dibe, xewn û xewnerojan dibîne, şadibe.

Mirov Herdem benda bûyerên ku dibin sedema qenciye ne. Roj yan jî demên bûyerên qenc dibin sedema rêzgirtin û hurmetê. Ji ber vê egerê di heman rojê de her kes şadibin, hev û du pîroz dikin.

Her wiha ji rojên wisa re dibêjin cêjn!

Cêjn rojên taybet in, bi gorî mijara xwe, ew yan netewî û yan jî cêjnên olî ne. Rojên wisa taybet û girîng di demên diyarkirî de tên pîrozkirin. Ji van rojên girîng yek jî Newroz e.

Cêjn kêfxwaşî, coş, şahî û bextewarî ye.

Koka navê cêjnê ji Zimanê Proto-Hînd-Ewropî ye. Ji pêyva PHE \*ues- ‘cêjn’<sup>1</sup> maye. Diyare PHE \*ues- ango navê cêjnê bi xwe jî, ji rengdêra PHE \*uesu- ‘baş, rind’ derketiye holê. Jixwe Proto-Îranî \*zauš- (zoş/coş) jî tê wateya kêf û şahî yê

Newroz tê wateya roja nû, lê roja nû ya ku bûyera herî girîng diqewime, roja nû ya ku guhêrandina mezin çêdibe.

Diyare, demekê ji deman, rojekê ji rojan di Kurdistanê de bûyereke pir mezin qewimî ye. Vê bûyerê jiyana civaka Kurdistanê û yên dor û berên wê ji bingeh ve guhêrandiye. Helbet heman bûyer bûye sedema kêf û şahiya gelan. Jivê kurdan û gelên dor û ber ew wek rojêke taybet nixandine û bi wek Cêjna Newrozê binavkirine.

Hin millet Newrozê wek cêjneke olî, hinên din wek cêjneke çandî, kurd jî wê wek cêjneke netewî dinirxînin û efsaneya wê biserûber kirine.

Her wiha, Efsaneya Newrozê di heman demê de Mîtolojiya Kurda ye jî. Angoreyî wê efsaneyê dibêjin ku demekê ji deman di Kurdistanê de şahekî pir zalim hebû. Navê wî î Dehak bû. Rojekê li ser herdû milên Dehak du Kînorên wek maran derdikevin. Di laşê wî de êşeke pir dijwar peyda dibe. Ji bo wê nexwaşiyê xilas be gazî gelek doxtor, afsûnkar û sêhîrbazan

---

<sup>1</sup> Julius Pokorny, 1171:2

dike. Lê belê, ew nikarin ji kula wî re dermanan peyda bikin. Her çi roj derdas dibin ew kînor mezintir dibin û dişibên wek du maran.

Piştî demeke kurt hekîmekî biyanî tê li ser Dehak, jê re dibêje dermanê te mujiyên ciwana ye. Piştî ku Dehak van gotinan dibêze, fermanê dide celladên xwe ku her roj mujiyê du zarokan ji wî re bînin. Ji ber vê egerê her roj du zarok tên kuştin.

Dibêjin hingê zilm û stemkariyeke bêsînor tê meşandin. Heta celad jî ji ber zilma Dehak eciz dibin û dilê wan bi zarokên qurbanî dişewite. Ji wê hingê pê ve rojê zarokekî dikujin yekî jî azad dikin.

Di wî welatî de hesinkarek jî hebû, navê wî jî Kawa bû. Heta çend zarokên Kawayê hesinkar jî dikujin.

Şênîyên bajêr bi rêbertiya Kawayê hesinkar dijî Dehakê Zalim serhildanekî pêktînin. Di encemê de wî û hevkarên wî dikujin. Her wisa gel ji zilm û koletiyê rizgar dibe.

Kawayê Hesinkar, piştî ku Dehak dike agirekî dadide ta ku bila serkeftina wan ji dûr ve bê zanîn. Ew agir hingê dibe nîşana wê rojê.

Ew roj, ji bo gel dibe rojê nû. Ji ber vê sedemê jê re dibêjin Newroz.

Gel hersal bi vêxistina agiran wê rojê wek “Cêjna Newrozê” pîroz dikin.

Jixwe gelek varyantên wê hene. Diyare wariyanta gelerî li ser bingehên hûmanîzmê, siyasî û çandê hatiye hûnandinê. Ji ber van sedeman Newroz ji bo kurdan bûye cêjneke netewî.

## **DÎ NEWROZÊ DE ROLA KURDAN ÇI YE?**

Welatê Kurdistan, ango Kurdistan çaterêya gel, şaristanî, çand û ola ye.

Gelê Kurd, ji berhemên xwe yên hizrî û derûnî him dane yên dereke û him jî ji wan welgirtine.

Di Kurdistanê de hizir û raman zû pêşketiye ku ev jî bûye sedema destnîşankirina rojên taybet.

Newroz berhemê esmanasîyê ye.

Gelê Kurd vejîna xwazayê, di bin navê Newrozê bi mîtolojî, efsane û çîrokan xemilandiye.

Gelê Kurd, azadî wek qencrîn rewşa mirovan nixxandiye. Ji ber vê egerê Newroz wek roja sedem, hilpekandin û pêşvebirina azadiyê pejirandî ye.

## **QENCIYÊN NEWROZÊ ÇI NE?**

Newroz, dumahika zivistanê, destpêka buharê ye.

Wek, xeza ji nû ve têdizê.

Ji ber ku li roja Newrozê;

Tîrêjên rojê tîk ango di 90<sup>0</sup> pileyî dadikevin li ser Ekvatorê û dirêjiya şev û rojê dibe wekhev. Li vê bûyerê re dibêjin “Ekînoksa Buharê”. Jixwe, salê du Ekînoks pêktên. Newroz a

buharê, Tolan jî ya payîzê ye. Dema Ekînoksa Payîzê roj kintir şev jî dirêjtir dibin. Lê dema ku ekînoksa buharê ango Roja Newrozê, roj li her dû cemsaran wekhev e.

Ji wê rojê pê ve li Cemsara Bakûr şev kintir, roj jî dirêjtir dibin. Ya başûr jî berawajîya wê ye.

Her du cemsar roja 21ê Adarê li ser xêza hilhatina rojê ne.



### Li Amedê dema Ekînoksa 20 Adarê:


*Roj saet 05:36<sup>↑</sup> 94° ji aliyê rohilat hiltê*

*Saet 17:23<sup>↑</sup> 266° bi aliyê rojava ve diçe ava.*

*Her wisa dirêjiya roj û şevê dibe wekhev.*

*Hingê li Amedê li ser hev 11 saet 46 xuleyan ronahî ye.*





## DÎROKA NEWROZÊ JÎ KÎNGÊ VE DESTPÊKÎRIYE?

Di baweriya Kurdan de agir pîroz e. Helbet bingehê vê hizrê ji serdema seretayî pê ve heye. Wek tê zanîn gerdûn ji curbecur qonaxan re derbasbûye û paşê jî gihiştîye şeweyê xwe yê hemdemî. Ji qonaxa çaremîn re dibêjin Serdema Qeşahiyê (Pleistosen) ku bêhtirî % 30 yê gerdûnê di bin qîşayê de bû. Serdema Qeşahiyê dor û berê du milyon û nîv salan destpêkiriye û ji 10.000-14.000 salan ji berya niha jî dawî bûye.

Mirov, di qonaxa dawiyê ya Serdema Qeşahiyê de êgir keşif dikin û pey vê demekî şûn de jî dikarin bixin bin çavdêriya xwe. Ji bidestxistina êgir pê ve jiyana mirovan pir hatiye guhêrandinê. Beriya her tiştî mirovan bi saya êgir di nav hemû hoy û mercên xezayî de karibûne jiyana xwe bidomînin. Ji şkeftan ango ji bin zemîn derketine li ser zemîn. Her wisa çand û huner jî pêş dikeve.

Bi êgir ne bi tenê jiyana mirovan asantir bûye, di heman demê de tewrê hizirandina mirovan jî hatiye guhorandin. Miravan agir wek parçekî, yan jî cirîskekî rojê sêwirandine. Her wiha çawa roj/xor pîroz dizanibûn, agir jî wek nîşan, zelalî û paqîşîya rojê pejirandine. (Îro jî hinekî wisa ye).

Ji bo mirovên Serdema Seretayî parastina êgir pirsgirêke mezin bû. Ji ber ku ne nift ne jî niftik hebû. Diyare hin agirgehên ku nedihîştin agir vemire hebûn. Her wisa ew der demên serma û seqemê dibin cih û warên civînê yê komên sereteyî.<sup>2</sup> Ev cih û war paşê dibin perestgeh. Hizir û hewildana parastina êgir, mirov dighîne hizra damezrandina perestgehan.

<sup>2</sup> Heta îro jî di hin gundan de tendûr heye û şênîyên malbatê zivistana yan jî rojên sar dora tendûran dicivin, çîrok û serpêhatîyan xwe yan jî yê bihîstî vedibêjin.

Bi taybet di cihanê de kevneşopa perestgehên ku agirên wan hertim vexistî dimîne, li Kurdistan, Îran û Hîndîstanê hê jî hene.

Di baweriyên mirovan de cihekî êgir mezin heye. Agir yan ji bo sezadanê, yan jî ronakbûnê hatiye selimandin. Di mîtolojiya hîndê de agir di bin çevderiya xwedawenda Agniyê de ye. Bi gorî mîtolojiya yûnanan Zeûs bi armanca sezadayîne êgir ji mirovan distîne. Lê belê Protémûs jê didize û dide mirovan.

Mirovan agir yan mîna tişteki pîroz yan jî sezadanê sêwirandine. Lê belê gelê Kurd agir hertim wek heyberekî pîroz naskiriyê. Heta dikarin bêjin ku ji gelek milletan zêdetir ev bawerî di Kurdistanê de hebûye. Di baweriyên kurdan a kevn de agir nîşan û direfşa enerjîyê ye. Jixwe sedema liv û hereketê enerjî ye. Kurdan mîtolojiya xwe ser bingehê pîrozbûna êgir damezrandine. Kurd, êgir wek heyberekî zelalbûn û paqijbûnê dizanin. Jixwe ronakdariya êgir îro wek find û şemdanan di hemû ol û baweriyên de rewacê de ye.

Di hemû olên berê yê Kurdistanê de rola xweda yan jî xwedawendên rojê hertim sereke bû.

Mirovên ku Serdema Qeşahiyê di şikeftan de dijîyan, jiyana xwe ya rojane wek xêzeromanan bi wêneyan destnîşan kirine. Ji nav van wêneyan de hesreta xwe ya rojê jî diyarkirine. Yanê wêneyê rojê jî çêkirine.

Nîşana Mîtra roj e.

Rêvebirê êgir yê Îndo-Îranî Agnî ye. Jixwe Agnî bi Zimanê Sanskrîtî tê wateya “agir”.

Nîşana xwedayê Zurvan dem e. Dema herî guncav jî Newroz e.

Xwedayên rojê yê Horî-Ûrartûyan Şimîge/Şivînî ye û nîşana wî jî roj e.

Nîşana mîtanî, med û asûran teyreroj e

Nîşana Ahûra Mazda tîrêjên rojê ne.

Perestgehên dema kevin ên Kurdistanê cih û warên şopandina roj, hîv, stêrk û gerestêrkan bûn. Her wisa Ekînoksa Buharê jî hingê keşif kiribûn.

## **NEWROZ JÎ BO KÎJAN MÎLLETAN CÊJN E?**

Newroz bûye cêjneke unîversal ango gerdûnî. Hemû gelên cihanê di bin navên curbecur Newrozê pîroz dikin.

Newroz cêjna buharê ye ji ber vê yekê di heman demê de cêjna bereketê ye jî.

Sûmerî, Babîlî û Asûriyan ji Newrozê re digotin cêjna Akîtu

Horî û Hîtîtiyan digotin Pûrûlî.

Sûmerîyan, Newroz li ser bingehê Mîtosê Dummûzî û Înnanayê histirandine.

Hîtîtî vê bûyerê di Mîtolojiya Telpînu-Xwedayê Wendabûyî de derbîran dikin.

Keça Zeûs û Xwedawenda Bereketê Demterê (navê wê Persephone ye) ji hêla xwedayê welatê miriyan Hades tê revandin. Demeter ji ber vê helwesta Hades diqehire û êdî bereketê nade erdê. Paşê Zeûs dikeve navbera wan û Demeter qayîl dibe. Lê divê Persephone

hersal buhar, havîn û payîzan di gel diya xwe Demeterê bimîne. Zivistanan jî here bin erdê cem Hades.

Gelên Îranî jî Newrozê pîroz dikin û piraniya wan warbenda kurdî dipejirînin.

Mijara mîtolojiya Newrozê ya Kurdan naşibê ya gelên din. **Ji ber ku Kurdan Newroz ji destê xweda û xwedawendan wergirtine û kirine malê mirovan.** Li gel hatina buhar û bereketê, watedayîna azadbûnê jî bi Newrozê ve girêdane.

## NEWROZ JÎ BO KURDAN ROJEKE ÇAWA YE?

Newroz ji bo kurdan rojeke him netewî him jî navnetewî ye.

## Taybetmendiya Newroza Kurda a herî girîng çî ye?

Dema mirov bala xwe dide mîtolojî yan jî efsaneyên gelên cîhanê, qehremanên sereke yê wan xweda, xwedawend, şah, şahzade mîr û rêberên olî ne. Lê belê di Mîtolojiya Newroza Kurdan de rêberên sereke pişekar, kedkar û karker in û dijî serdestan serî hildane û şoreşeke çîneyetî pêkanîne. Ji ber vê egerê mirov bi dilaramî dikare bêje ku cêjna netewî ya Kurdan Newroz, cara destpêkê ji hêla çînen kedkar hatiye lidarxistin. Îro jî bûye malê pirnetewan. Jixwe, eger, Newroz li ser bingehê ked û mafdariyê nehatiba damezrandinê, hebûna wê heya îro jî berdewam nedikir.

Ji ber van egeran dikarin bêjin ku;

Newroz cêjna Netewî û çîneyetî ya Gelê Kurd e. Ev rastî di kesayetiye Kawayê Hesinkar de pir zelal tê dîtin.

Hemû nav û navlêkên di Efsaneya Newrozê de bi kurdî ne. Hetta Navê Kawayê Hesinkar ê Kurd di kozmogoniya osêtan de bûye *xwedayê hesinkaran* û navê wî jî **Kurdalagon** e. Osêtiyan Kawayê hesinkar wek Kurdalagon, ango bi navê hesinkarê kurdan derbîran kirine.

Fîrdowsî di Şahnameyê de, Omer Xeyam jî di Newroznameyê de dibêjin “Newroz cêjna kurda ye.”

## BAWERIYÊN OLÎ JÎ BO NEWROZÊ ÇI DIBÊJÎN?

Hemû lêkolîner Newroz û Zerdeştîyê bi hev re girê didin ku ev hizreke girîng e. Ji ber ku hizra têkoşîna navbera qencî û neqenciye bingehê ola Zerdeştîyê ye. Her çendî ev hizir cevherê hemû baweriyên be jî, qasî ola Zerdeştîyê de zelal û eşkere nîne. Yanê nûnerên qencî û neqenciye zelal karakterîze nekirine. Di ola Zerdûşt de ev bûyer wek du navên sereke hatine destnîşankirin ku ew jî Ahûra Mazda û Ehrîman in.

Di olên wek mûsevî, xiristiyan û misilmaniyê de bi tenê Xwedayê qenciye heye. Ew karakterên ku neqenciye pêşve dibin jî fêrişte yan jî mirovên ji rê derketî ne.

### **Bi gorî minhoyên hin olan tê gotinê ku;**

Xwedayê dilo van, cihan dema ku şev û roj hewqasî hev dirêjbûn, yanê roja Newrozê afirandiye.

Heriya ku Ademê bavê mirovahiyê pê çêkirine roja Newrozê hatiye vestirandin.

Hiz Yûsif roja Newrozê ji bîra avê ji hêla bazirganan hatiye rizkarkirin.

Hiz Mûsa roja Newrozê bi gopalê xwe Derya Sor kiriye du parçe û paşê îsrayîlzade derbasî aliyê din yê deryayê bûne.

Masîhût roja Newrozê pêxember Yûnis ji devê xwe derdixe û datîne peravê deryayê.

Tê gotinê ku dema Xwadê mirovan diafirîne, hemû stêrk di Mîşkatê/Burca Hemal de rêz bibûn, hingê Xwadê fermanê dide wan ku hemû vegezin herin li ser felekên xwe.

### **Di misilmaniyê de gotinên derbareyê Newrozê wiha ne:**

Xwadê, dema ku şev û roj qasî hev bûn, ango roja Newrozê cihan afirandiye.

Mirovê ewil Adem e û ew jî roja Newrozê hatiye afirandin.

Pêxembertî roja Newrozê ji bo Hiz Mehemed daketiye.

Adem û Hewa, piştî ku ji buhuştê tîr qewitandinê, demeke dûr û dirêj ji hev cûda dimînin. Piştî ku Xwadê tobe û bûjmaya wan dipejirîne ew roja Newrozê digihîjine hev û du.

Keştiya Nûh roja Newrozê digihîje hişkayê.

Îsrayîlzade roja Newrozê ji Derya Sor derbas dibin û xwe rizgar dikin. Her wisa wê rojê Fîravûn jî dixeniqe.

Elewî dibêjin Elî roja Newrozê ji dayîka xwe bûye. Heta dibêjin roja zewaca wî bi Fatmeyê re jî Newroz e.

Roja Îbrahîm pêxember davêjin nav êgir jî Newroz e.